Çend projeyên nû li parêzgeha Duhokê

Amadekirin: Mizgîn Doskî

Vekirina sê bank û danana berê biniyatî bo du pirojên nû

li roja 1/4/2007 çend proje hatine vekirin û berê binîyatî bo hindekên dî hate danan:
1-vekirina banka mangêşkê, li ser rûberê 1500 m2 hatî ye avakirin û ji sê nihoma pêk dihê.
2- vekirina banka Batîfa, ji sê nihoma pêk dihê. Kojmê terxankirî bo avakirina herdu banka (1) milîyar û (600) milîyon dînarbûn. herwesa li roja 2/4/2007 bi amadebûna birîkarê wezareta darayî banka (Şêxan), bi kojmê pitir ji (900) milîyon dînaran hatevekirin. Armanc ji avakirina wan bankan ewe ku xanenşîn û xêzanên şehîdan li herdu deveran heyvaneyên xwe lê werbigirin.
Jilayekê dîve li roja 1/4/2007 berê binîyatî bo avakirina dezgayê Eylolê li Zaxo hate danan, parê terxankirî bo pirojey, (434) milîyon dînar e rûberê gişyê yê avahî 1800m2 ji du nihoma pêk dihê.
Her wesa berê binîyatî bo avakirina banka bazirganî li Zaxo, bi kojmê (1) milîyar û (676) milîyon dînaran hate danan. Avahî li ser rûberê 2000 m2 dê hête avakirin. proje bi piştevanîya wezareta darayî ya hikumeta herêma Kurdistanê hatîne encamdan.

Vekirina avahiyê nû yê êketîya nivîserên kurd liqê duhok

Êvariya roja 22/4/2007 û bi helkefta 109 saliya rojnamevaniya kurdî û bi çavdêriya berêz Temer Remezan parêzgerê duhokê û amadebûna çend rewşenbîrên Kurdistanê avahiyê nû yê êketiya nivîserên kurd liqê duhok ji layê (Şukiriye Resul) hatevekirin.
Avahî li ser rûberê (5500) m2 hatiye avakirin û ji sê nihoma pêk dihê, holên simînaran û jorên kargêrî û baxçe û yana civakî bi xweve digire, hikumeta herêma Kurdistanê pitir ji (910) milîyon dînaran bo çêkirina avahî û kirîna kel û pelên nav avahî terxankiribûn. li dor giringiya avahiyê nû Hesen Silêvanî got: ev avahiye wê bibe hokarek ku nivîser û rewşenbîr çalaktir bin, her wesa me li bere festîvala sêyê ya rewşenbîrî livî avahî bigêrîn.

Vekirina du pira li devera Guliya

Bi amadebûna Temer Remezan parêzgerê duhokê û çend ber pirsên hizbî û îdarî li roja 29/4/2007 pirojê pira dêrîşkê bi gojmê 257milîyon dînar ji layê hikumeta herêma kurdistanê li devera Batîfa hate vekirin û pira kurka li ser rûbarê xabûrî li devera gulîya hate vekirin.cutîyarên gundê dêrîşkê û xelkê gundên dî wê mifay jê wergirin.
Hejî gutinê ye her du pir ji layê rêveberiya rêk û pira li duhokê hatîne bicanîn, bi çêkirina herdu pirojan jî, jimara pirên piştî ser hildanê ji layê rêveberiya navbirî hatîne çêkirin gehişte (27) piran.